www.kurdistannet.org
23-9-2007 19:43:06بەکاتی ناوەندی ئەوروپا

Pêşmergê Zêrevaniyê Kurdistanê difiroşin Ereban

Ereb kirina Kurdistanê berî 1400 sala destpêkiriye, lê 35 salên deshelata rejîma Beas bi metirsîtirîn û xirabtirîn qonaxaEreb kirinê tê zanîn, ku di vê qonaxê da baştirîn û giringtirîn deverên başûrê Kurdistanê hatine Ereb kirin.

Vaye 4 salin hikumet û gel û serokatiya Kurdistanê şerekî dîplomasî û siyasî yê dijwar dimeşînin ji bo zivirandina van deverên Ereb kirî bo ser Kurdistanê û di vê rêkê da gelek kar û xebat û pere û giyanên mirovan jî hatine mezaxtin û berdewam jî têne mezaxtin, lê dîsa jî hêjî rêkeka dûr li ber kurdane û gelek renc û xwîna din pêdivê ji bo bi cî anîna vê armancê.

Helbet hêza Pêşmergê Kurdistanê jî bihemû dezga û corên xweve di nav vê xebat û bizavê da ye ji bo zivirandina van deverên Kurdistanê û parastina wan û eve jî erkekê normal û siruştiyê hêza Pêşimergê Kurdistanê ye. Û di vî warî da rola Pêşmerge gelek berçav û diyare û Pêşmerge xaleke ji xalên bi hêz ên Kurdistanê ku pişta xwe pê gerim kiriye ji bo zivirandina deverên Ereb kirî û gelek gencên me ên Pêşmerge ta nuha xwîna xwe a pir buha di vê rê da gorî kiriye.
Lê gelek mixabin van salên rewşa ne normala Kurdistanê û bi taybetî salên şerê birakujî ê malwêranker rêk ji bo gelek kevne Beasî û caş û sîxorên berê xweş kir ku xwe wekî marekî jehirdar bikêşne nav rêzên Pêşmergê Kurdistanê û di wir da li ser navê pak û mezinê Pêşmergey berdewamiyê bi kar û kiryarên xwe ên xinizkarî û kirêt bidin dijî doza pîroza Kurdistanê û li ser hesabê xelkê Kurdistanê û xwîna şehîdan bêrîkên xwe tejî pare bikin.

Yek ji nimûnên herî berçavên van karan jî kar û kiryarên (berpirsê hêza yek a supayê dû ê Pêşmergê Zêrevanî) ne li Qeza Tilkêf a bakûrê bajarê Mosil. Herwekî tê zanîn (hêza yek a supayê dû ê Zêrevanî) berpirse ji asayiş û zêrevaniya devera Qeza Tilkêf a bakûrê Mosil. Helbet akinciyên bajarkê Tilkêf bixwe jî hema bêje hemû Kirîstiyanên Kildanî ne û gundên deûruber jî di ser Ereb kirina wê deverê jî ra hêjî piraniya wan kurdin.
Tiştê seyir û ne beraqil jî ewe ku şûna (hêza Yek a supayê dû ê Zêrevanî) li wê deverê hewil bide ku piştevaniya madê 140 bike û alîkariya serokatiya Kurdistanê bike ji bo zivirandina deverên Ereb kirî ên bakûrê Mosil, berpirsê

hêza navibirî (Sefer Amêdî) û bi şirîkatî tevî (Qaymeqamê Qeza Tilkêf) dest pêkiriye bi pere bi sedan hezar mîtirên erdî li ser Erebên Mosil belav dikin li bajarkê Tilkêf û ev jî bûye egera hindê ku ew cihên di dema Sedamî da li wê deverê nehatîne Ereb kirin nuha ji aliyê van herdû kesan ve têne Ereb kirin û xelkê wê deverê dibêjin: eger hikumeta Kurdistanê bi lez sinûrekî ji bo van herdû kesan danenê ne dûre di çend mehên bê de ew dever hemû bêne Ereb kirin û herwesa dibêjin: Me wesa hizir dikir ku hebûna Pêşimergey li van deveran wê bibe egera zivirandina deverên Ereb kirî, me nezanî ku ev kesên (ku mixabin navê Pêşimergey li ser wane) wê deverên mayîn jî bifiroşne Ereba û wan deveran jî Ereb bikin..!!
Hindek çavkaniyên ku nexwestin navên wan bêne aşkera kirin dibêjin ku: Cîgirê berpirsê supayê dû ê Zêrevanî û hindek berpirsên din jî ên ji dervey Zêrevaniyê li devera Behdînan di vê bazirganiya Ereb kirinê de şirîkin.

Li dawiyê hîvîdarîn hikumet û serokatiya Kurdistanê xemekê ji vê problemê bixo û nehêle deverên Kurdistanê ên mayîn jî bêne Ereb kirin ji bo tejî kirina bêrîkên hindek kesan ku wekî kirmî ketîne di nav rêzên Pêşimergê Kurdistanê da ku ew dikin Kurdistanê hemûyê bi 1000 dolara bifiroşin.

Xoşnav Dasinî
Şêxan